Australian Government

COVID-19 VACCINATION

# Bandorên dem-dirêj ên COVID-19

27 Hezîran 2022

Piranîya kesên ku bi texûba/şoba COVID-19 dikevin dê ji bo demek kurt semptom/nîşanên wan hebin û piştre ji di nav çend hefteya de baş bibin. Wexta pêdivî bo başbûyîna ji COVID-19 ji bo herkesî dude ye. Ev girêdayî ya ka hûn bi COVID-19 çiqas nexwe ketine. Ev herweha dibe girêdayî ya mercên niha ên tenduristîya we ye.

Hin kes hene ku bişti pêketina şewba COVID-19 pirsgirêkên tenduristiya dem-dirêj bi wan re peyde dib e. Carna COVID-19 dibe sedema ku mirov piştî nexweşîya destpêkê wê nexweşîya wan bi mehan zêde bikşîn e. Ji vê re 'COVID-a dirêj' tê gotin. COVID-a dirêj dikare gelek heftan û mehan bidome, tewra kû bi wî kesîra vîrûs tune be jî.

COVID-a e îhtîmalek mezine ku di nav mîrovên bi giranî bi nexweşîya COVID-19 ketine peyda dibe. Lêbelê, heya mîrovên bi sivika jî bi enfeksîyona COVID-19 ketibin û hewce nebîye ku biçin nexweşxanê jî dîsa dikarin bi COVID-a dirêj bikevin.

## Semtomên/nîşanên COVID-a dirêj

COVID-a a dirêj dikare bibe egera demptomên cûrbicûr û dibe kû banor bi her aynî awayî bandor li herkesî meke. Semptom dikarin heya piştî enfektebûyîn berdewam bike, an dikare ji paş ve dîsa vegere biştî zilamek ji COVID-19 xilas be jî.

Îşaret/semptomên herî hevpar ên semptomên hatine ragihandin evin:

- westiyaybûn
- tengbûna nefesê
- kuxika berdewam
- êşa singê
- êşa movikan
- kêmasîya enerjîya bo werzîşê
- agir/ta
- serêşî
- astengîyên bi bîranîn û dijwariya ramana a zelal re girêdayî (mija mêjî)
- depresyon an xemgînî.

## Pêşgirtin li COVID-a dirêj

Rêgehî herî qenc boy berlêrgitin li COVID-a ew ku xwe ji jarhirketina bi vêrûsa COVID-19 parastin e.

Derzî lêdan rêya herî qence bo kêmkirina xeterîya COVID-19.

Lêkolîn pêşnîyarî dikin ku kesên li hember COVID-19 hatine vaksînkirin wê îhtîmaek kême ku wê ew semptomên COVID-a dirêj bi gorî kesên ku qet nehatine vaksînirin rabigihînin.

## Ji bo hgahdarîya zêde

Heke hûn ji çend heftan zêdetir berê encama ceribandina we ya COVID-19 pozîtîf derketibe, û hê jî nexweşî bi were heye, bi doktorên xwe re bipeyîvin.

Ji bo agahdarîya zêde, serdana health.gov.au/covid19-vaccines-languages bikin, an banga bo Xetalîkarîyê Vêrûsacorona Neteweyî li ser 1800 020 080 bikin. Ji bo xizmetguzarîya tercumanîya belaş vebijarta 8 biniqînin